

...

داخوایانی بۆ هه‌فکارێن خوانده‌فان و نفیسکار، ئه‌فجا بۆ مالپه‌رئ په‌يامنێر:
په‌يامنێر سوپاس، به‌لئ سهرئ كه‌چه‌ل د كوم ده تازە یه!



سه‌بری سلیفانی (www.silevani.com)

ل گۆری سنج و پرنسیپین نفیسکاریی من دۆزا مافه‌ك ره‌وا كر ژبه‌ركو ئه‌و ماف ب ئاواپه‌كئ ژئاوایان هاتبوو پێشپلكرن و هه‌و.

من راگه‌هاند كو مالپه‌رئ په‌يامنێر بئ ده‌ستوور، بئ ئاگاهداری ده‌ستكارییا وه‌رگێرانا من بۆ گۆتارا سه‌رۆكئ لیبیایی برێز موعه‌مه‌ر ئالفه‌زافی كرییه و دكۆفارا نویبوون ده (ل ده‌وكئ) ب ناڤئ خوه به‌لاف كرییه و ل گۆری ئاكاری نفیسکاریی من ریز گرت و ئه‌ز دئ هه‌ر بگرم به‌لئ ل به‌رامبه‌ر ئئ چه‌ندئ مالپه‌رئ په‌يامنێر چ كر؟

په‌يامنێر وه‌ك كو د ره‌هنكرنه‌كئ ده سه‌لماندئ، ب شێوه‌یه‌ك به‌عسیانه ، لامژانه به‌رسفا خوه دا و دویری ریزگرتن و ئاستئ به‌رپرسانیی. من نه‌دخوازت كو ته‌نانه‌ت یه‌ك كێلێكئ ژئ ژده‌مئ خوه ب ره‌فتاریئ په‌يامنێر ببورینیم ژبه‌ركو ئارمانجا نفیسکاریی نه‌ ئه‌وه و ژبه‌ركو ژئ ل دوماهیئ ئاكام سته‌وره ل گه‌ل هشمه‌ندییا داگێزكری ، نه‌سه‌رخوه و میشك داپۆشایی به‌لئ هه‌فكارێن خوانده‌فان و نفیسكار جه‌خت ل سه‌ر سه‌لماندنا راستیئ كرن ژبوو كو جاره‌ك دن دووباره نه‌به‌.

دجیهانا وێژه‌یی ده، هه‌روه‌ها یا ره‌وشه‌نبیری و روژنامه‌گه‌ریئ ده ژئ - پێویسته - ، هلبژاردنا په‌یف و ده‌رپرینان كاره‌ك هه‌ستدار به، ل سه‌ر هه‌ز، توانا و بنه‌مایین خوه‌یی دمینه ژبه‌ركو په‌یف ئامرازه بۆ داھێنان و به‌ده‌وكاریئ، به‌لئ شێوه‌یی بكارهینانا په‌یف و ده‌رپرینئ ب ئاستئ ئانالیز و هشمه‌ندیئ فه‌ گریڤدای نه‌.

په‌یف و زمانئ ده‌رپرینا مرو‌فان وه‌ك ئاوینه‌یه‌كئ نه‌یینیئ دناڤا ده‌روونا مرو‌فان ده‌ فه‌شارتی ئاشه‌را دكه‌.

پرسیار: چما هه‌تا نها د چارچووه‌یی روژنامه‌گه‌رییا فه‌رمی ده ژئ ره‌خنه‌ هیژتا واته‌یا نه‌ریئنی رادگه‌هینه‌؟

پرسیار: مالپه‌رئ په‌يامنێر نمونه‌یه‌كه ژكێژان روژنامه‌گه‌ریئ؟

پرسیار: مالپه‌رئ په‌يامنێر روژنامه‌گه‌رییا كلاسیكه یان یا سفیلانه‌؟

به‌ری كو به‌رسف دیار ببه گه‌ره‌كه مرو‌ف جیاوازیئ دناڤه‌را روژنامه‌گه‌رییا كلاسیك و یا سفیلانه ده ب كورتی بزانه:

روژنامه‌گه‌رییا كلاسیك: روژنامه‌گه‌رییا پارتیی سیاسی یه، هه‌روه‌سا روژنامه‌گه‌رییا كه‌سان، هه‌رده‌م د خزمه‌ت و به‌رژه‌وه‌ندییا وان ده یه دویری پرنسیپین بلند و پاك وه‌ك مافی ئازادییا ده‌رپرینئ و ئافاكرا ره‌خنه‌یی سه‌خمه‌راتی وه‌رار و نویژه‌نیئ.

روژنامه‌گه‌رییا سفیلانه: روژنامه‌گه‌رییا نویژه‌نه، سه‌رخوه و ب هیزه. هه‌رده‌م ل په‌ی راستییان دگه‌ره هه‌رچه‌ند ئازادار و دژوار ژئ بن، د به‌رژه‌وه‌ندییا كۆمه‌لگه‌هه‌ و سفیلان ده یه، هه‌روه‌ها دامه‌زینگه‌هه‌ و سازییان ده.

ئەز باوەر دكم كو خواندەفان هشمەندە و دكارە نافا رستەیان بخوینە بەلئ مخابن كو هەندەك دەزگەهین راگەهانەنئ بیئ كلاسك هیژ پاشفەرۆو نە و ب شیوهیئ سەیر سەرەدەریئ ل گەل خواندەفانان دكن . كلاسك نە تنئ جەه زەمان و بەرگە بەلئ مەبەست واتەیا كلاسكە ل گۆری ئالاف، پەرۆدە، ناسنامە و دەربەین .

خواندەفانی هیژا،

كەرەم بكە وەرگێرانا من بۆ گۆتارا بریز ئالفەزافی بخوینە (<http://www.silevani.com/Nivisar-AlQezafi.htm>) و ل دویف ره وەرگێرانا مالپەرئ پەيامنێر ژئ بخوینە بەلئ فان تیبینیان ل بەر چاف وەرگەرە داكو راستی ئاشكەرە بیە:

- 1) شیوازیئ نفیسکاریئ و فەرەنگا زمان و ریزمانی .
- 2) زمانئ دەربەینئ .
- 3) زمانئ نفیسکاریئ وەك تەكنیک .
- 4) ئافكارنا رستەیان و دەستکاریا زیڤە ب مەبەستا گوهورینئ . وەكەقییا گۆتن و تیرمان .
- 5) جیاوازییا ریزمان و زارافان، ب هۆیئ دەستکاریئ پتر ژ دەفۆكەكئ د گۆتارئ دە پەیدا بوویە .
- 6) شیوهیئ بكارهیانا خالان ... هەرۆهەا بیهنۆك و دەستپیک و دوماهییا هەفۆكان .
- 7) ئاستئ وەرگێرانی و نەسازیا وئ .
- 8) ئەزموونا دەزگەه و تاكەكەسانە .
- 9) شیوازیئ وەرگێرانا پەيامنێر نەسازن ژبەركو هەفۆكا (و خرج الأكراد من المولد بلا حمص) ب كوردی نابە (كورد ژمەولوودئ بی نیسك دەرکەتن) چونکی ئەفە وەرگێرانا فەرەنگی یە و نە واتەیی یان رۆژنامەگەری یە .

ل فیرئ بیرا بوویەرا هەفۆهلاتییەك كورد ل هۆلەندا دەئ بیرا من: ئەو پیرەمیر چوو بازاری (سۆپەرماركتئ) و گۆت من (زفارتە تۆماتۆ) دفتن ، ئانكو دخوازت ببیژە من باجانزەشك دفتن بەلئ كەسین هۆلەندی ل وی تینەدگەهشتن و ماتمایی و سەرسام بوون . ئەو بوو هەتا كو هەفۆهلاتییەك دن كورد هات و هاریکارییا وی كر و رستەیا وی وەرگێراند بۆ هۆلەندی .

ئەو پیاو پیرەمیرە و ل گۆری زانینا خوە، زمانئ خوە هەفۆك د سەرئ خوە دە وەرگێراند بی لۆمەییە . بەلئ ئەگەر دەزگەهەك یان ئازانسەك یان مالپەرا پارتییهك سیاسی وی ئاستئ نزم پیشكیش بكە هینگئ بەرلۆمەییە و كارەساتە .

من وەها دزانی كو پەيامنێر دئ مفای ژ كیماسیئ خوە بكە و دووبارە نەكە بەلئ سەبارئ كیماسیئ ریزمانی و چەوتییا وەرگێرانی و قەلسییا ئاستئ رۆژنامەگەریئ مخابن پالاماری كەسان ددە و زماندیریئ ژئ دكە . گۆتنئ كریئ و نەشارستانی ب كار دەیینە . ئەز نا غەیدم، تۆرە نابم چونکی ئەز باوەر دكم ئەگەر هەندەك گۆتنئ جوان هەبان دا پیشكیش بكە بەلئ دیارە نینن . كەسئ كو تشتەك ل بال وی نەبە نكارە بدە ژئ .

پرسیار:

ئایا بۆچی پەيامنێر تۆرە بوو و گۆتنئ نەراھاتی و ئەرزان ب كار هینا؟ ئایا پەيامنێر هزرەك بۆ خوادەفان و نفیسكاران كر؟ ئایا زاگون و یاساییئ سنج و ئاكاری د جیھانا رۆژنامەگەریئ دە دیاریژە؟ ئایا پارتنی دیمۆكراتی كوردستان ب رەفتاریئ پەيامنێر ئاگەھدارە كا چاوا سەرەدەریئ ل گەل پرسان دكە؟

ھیژایان:

رەنگئ **رەش** بۆ فەگۆھازتنئ یە ب ریزەیا 80% ل گەل دەستکارییا ئاستەمی .

رەنگئ **كەسك** بۆ فەگۆھازتنئ یە ب ریزەیا 50% ل گەل دەستکارییا ئاستەمی .

ل داویئ دبیرم چاك بالا خوە بدە میژوویا وەرگێرانی: من ل رۆژا **25.08.2004**ئ گۆتارا ئالفەزافی وەرگێراییە بەلئ پەيامنێر ل **ئادارا 2005**ئ وەرگێراییە، كەواتە داوی 7 هەیفان .

ئێستا ژئ كەرەم بكە بەلگە و بەیانك دەربارە دزییا پەيامنێر بۆ وەرگێرانا من ب رینقیسا لاتینی:

(Wergêrana Peyamnêr bo gotara Al-Qezafî li Avdara 2005ê angû 7 heyvan dawî wergêrana min)

Wergêrana Peyamnêr : Adara 2005ê

Li Misrê dema kesek didorîne û tiştêk ji dest dide, weha jê re dibêjin (ji Mewlûd bê Nok derkevî) Weha jî **kurdan doran**, û ji mewlûdê bê nok derkevî! **Kurdan çî qazanc kirin ji Iraqê Hîç**. Tenê; **hembêzkirina serbazên dagêrkaran û maçên li ser rûyan li gel dagêrkaran nû** ji hakimên Bexda, tawanbarkirin xwe bi xiyane ta mezin û keftine jêr çingên dagêrkaran. Belê rewşa Kurdan nehat guhertin..lê xirabtir bû, bi layê kêmi ve ji aliyê toreyî ve her wesa ji aliyê rûxsarî ve jî.

Me mezinde dikir ku di demeka dîrokî ya diramatîk .. wek vê demê, delîveka dîrokî be bo kurdan. Bikarin ji xwe re veqozin- wek çawa cuhiyan veqozt di dema heriftina Berlînê de.. û dorrana dewletên tewer(mihwer).. û serkevtina hevpeymanan li şerê dûyî yê cihanî **ku dewlata Kurdî bihê ragehandin,hêvî û ûmîda neteweya kurd** ew gelê veçewsayî û parçekirî bi cih be... belê hîç.. Kurd her bindest man û bîyanî man li wan dewletên tê de dijîn.. **ti tiştê nû heye?** Ti destkevt bi dest ve hatine? **Hîç..** Kurd hêj her kurd e û hevvelatîyek pile dû û sê ye di hemû welatên rojhilata navîn de.

Li rewşa niha ya Iraqê hun bi

wergirtina posta wezareta derveyîya

Iraqê ji aliyê kak Hişyar Zê-

barî ve ne xapîyên, **berê jî Nûredîn Mehmûd serok wezîrên Iraqê bû,**

her weha Ehmed Baban jî, her dû jî kurd bûn, her wesa berê wezîrê karkirinan û gehandinê..

û hunduriyê û dad û darayê û bervaniyê jî kurd

bûn. Herweha kurdan serokîniya Erkanên Leşkerî Iraqê kirine wek serheng Bekir Sidqî û serheng Husên Fewzî û serheng Emîn Zekî.

Erê **rêjeya Kurdan ji fermanberên dewleta Iraqê digehişte 25%**, û li

deverên kurdan gehiştibû 97%. Kurdan li deverên xwe civatên gundan..

civatên nahîyeyan, civatên dadwerîyê û civatên lîwayan û civatên parêzgehan hebûn.

Zimanê kurdî û erebî jî fermîbûn di hinek parêzgehan de wek Silêmanîyê.

Zimanê xwendinê jî di qonaxên seretayîyê û navendîyê de li deverên kurdan bi kurdî bû.

Zimaê erebî jî zimanê diwê bû, ev e di salên şêstan de li Iraqê.

Mezinde dihat kirin ku li ber **sîbera evê bûyera pir metirsîdar li**

deverê, ku ji jêr dûkêla vê peqîna mezin dewlata kurdî serê xwe lê

hilde û bibe **sîwana parêzera kurdan ji çewsandinê û zulm û zordariyê** û kuştin û ji navbirinê

ku bi dirêjahîya dîroka xwe ya pir karesat

hevrûş bûne.

Lê divê em bizivirin wê destewaje ya pir êş û carek din bibêjin,

ew jî ew e ku **sebarî wan hemû şoriş û qûrbani serhildanan**

bextê kurdan tenê keser û hijmet û ahîne.

Ti tiştê nû heye.. **Kurd hevvelatîyên Iraqê ne, berê jî her ev** rewşa wan bû. Pa

kurdan çî qazanckirin ji pişikdariyê di ahenga wê mewlûda

ku Iraq bi tamamî hat **wêrankirin**, dûv re jî erê kurd tenê ewin ewên
ku li Iraqê hene? Pîranîya kurdan li derveyê Irqê ne, û kê m ji wan li
Iraqê dijîn, **ji bo çi çarenivîsa pîranîya kurdên li derveyê Iraqê dijîn**
dihê piştguh kirin û tenê tekez û cext dihê kirin li ser evê hijamra
kêm ji kurdan ku li iraqê hene? Erê **kî bazirganîyê bi doza pîroza kurd dike? Kî xwînê**
nizaran hizar şehîdên kurdan divexwe.. û froşyar û kiryar dê çi bi dest xwe ve hî nin?!

Eve encame piştî wê xwîna pakij ewa kurdan day li şoriş û serhildanên
Ebdullayê **Nehrî.. bedirxan.. botan..Neqşebendî.. şehabedîn.. şêx se'îd.. şikak..Ihsan Nûrî**
paşa.. Ehmed Barzanî..Reza.. û Mistefa Barzanî.

Eger niha li pêşiya me sateka **guhrînên dîrokî be..** û behsê rizgarkirina gelan bikin ji dest dagîrkar û sitemkarên **û**
çewsînerên wan.. xo **ti** milletek li hemû cîhanê qasî gelê kurd nehatiye çewsandin **û**
nekevtiyê ber dare zulmê.. ti milletek jî wek kurd jêrdest û bê desthilat nine, **pa bo çi bi dû**
pîvankan meseleyên çarenivîsî dipîvin... pa bo çi piştî kurdan nahê girtin û serxwebûn **û**
yekîniya wan nahê ragehandin **û ew şorên li ser**
serên wan naên havêjtin **û da ku kurd cihê xwe bigre wek hevsûyek**
cînarek **û birayek bo gelên ereb û faris û turk?!**
Kê kurd xapandin.. kê sewda bidoza pîroza wan kir.. **kê ew firotin?**

ئایا هیژتا بەلگه پێویستن ؟ ما رۆژ د بیژنگی ده دهی قهشارتن؟ بەلێ وهک کو په‌ندا مه‌زنان دبیژه : سه‌رێ
که‌چه‌ل د کوم ده تازه یه.

تێبینی 1: به‌ریزان، من تنی وه‌رگێرانا دزی ئاماژه بو ک‌رییه و ئەز ل سه‌ر ئاستی وه‌رگێرانی نه‌ راوه‌ستيامه
ژبه‌رکو مه‌به‌ست نه‌وه (بلا ئه‌و بو خوانده‌قنانان بمینه) چونکی خوانده‌قنان ب خوه دکاره بگه‌هه باوه‌ریی و
راستی.

تێبینی 2: ئەز په‌يامنێر ئازا دکم ژبه‌رکو کوردی یه به‌لێ ئەگه‌ر هات و جارەک دن دووباره کر و ب شیوه‌یی
لامژ، مشه‌خوور، به‌عسیانه، ره‌فتار هینگێ ئەز نه‌چارم په‌یوه‌ندی ب ئاوایه‌ک فه‌رمی ب وه‌زاره‌تا
ره‌وشه‌نبیری بکم ل هوکوومه‌تا هه‌ریمی چونکی ئەز دزانم کی به‌رپرسیارییا په‌يامنێر دکه به‌لێ ئەز نزانم
ئایا ئه‌و ئاگه‌هدارن یان نۆ.

ل دوماهیی دخوازم سوپاسیین خوه یین بی پایان ئاراسته‌ی هه‌موو هه‌فکار، هه‌قبیر، هه‌قزمان و هه‌فسۆزین
هه‌یژا بکم،
برایی وه سه‌بری سلێقانی.